# Perwerdeya Islamî

## Seretayî
## 5

2022 / 2023
1444

**Amadekar:**
Komîteya Perwerdeya Islamî

**Lêveger:**
Komîteya Şopandinê
Komîteya Redekteyê
Komîteya Dîzaynê

**Mafên amadekirin û weşanê ji Saziya Minhacan û Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê re parastî ne.**

**Çapa yekem**
**2022 / 2023**
**1444**

# Pêşgotin

Li gorî plana Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyayê û di bin serperiştiya Saziya Minhacan û Kongireya Islama Dîmokratîk de, em pirtûka «Perwerdeya Islamî» ya refa pêncan a qonaxa seretayî pêşkêşî mamoste û xwendekarên xwe dikin. Ev yek di çarçoveya perspektîfên ku baldariyê didin curetiya fêrkirinê û bi şêwazekî perwerdehî û bipêşketî baştirkirina berhemên wê ku dixwazin reftarên erênî û sincî li gel xwendekar xurt bikin, pêk tê. Bi rêya xurtkirina reftarên erênî û sincî, dixwaze wan nirxên perwerdehî weke reftar, di jiyana piratîk de, pêk bîne. Her weha dixwaze ew xwendekar hevsengiyekê di navbera berpirsyariyên xwe yên kesayetî û civakî de, pêk bîne. Ji ber vê yekê, me xwest di vê pirtûkê de, ziman zelal be û şêwaz hûrbîn be.

Ev pirtûk ji pênc beşên ku mijarên wan cihêreng in pêk tê. Mijarên wê di çarçoveya Qurana Pîroz, jînenîgariya pêxembertiyê, sinc û peristinê de ne. Ev mijar bi rengekî hevtemamker û lihevhatî, hatine hûnandin. Her weha her beşek, xwedî armancên fêrkirinê ye û di dawiya her beşekê de, tê pêşbînîkirin ku ev armanc ji hêla xwendekar ve, pêk bên.

Waneyên pirtûkê bi şêwazekî piratîkî û encamderxistnê, hatine amadekrin. Her weha wane bi wêneyên raveker û bi şêwazê gotûbêjê (mamoste- xwendekar), hatine dewlemendkirin da ku deriyê afirandinê li ber xwendekaran bê vekirin û ji şêwazên kilasîkî û ezberkirinê, dûr bikevin û di encamê de, xwendekar karîn û hêzên xwe, di pêşketina kesayetên xwe de, berhênan bikin.

Di dawiya her waneyekê de, nirxandineke bi navê **«ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim»** heye. Ev yek derfetê dide xwendekar ku gotûbêjan bi kesên dîtir mîna mamoste, heval û xizmên xwe re, bike.

Ji ber ku naveroka pirtûkê bingehê birêvebirina pêvajoya perwerdeyê ye, em ji mamosteyên xwe hêvî dikin ku naverokê, bi rengekî nimûneyî bi kar bînin û baldar bin ku çarekirina çalakiyan li ser lênûsê be. Her weha em ji sermiyanên xwendekaran ên rêzdar, hêvî dikin ku zarokên xwe bişopînin û reftarên wan ber bi başiyê ve bibin; bi rengekî ku sincên baş û nirxên bilind li ber çavên wan bên dayîn.

## NAVEROK Û BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ


| Qonax | Naverok | Rûpel | Hejmara parên xwendinê | Meh |
|---|---|---|---|---|
| Qonaxa Yekem | BEŞA YEKEM | 7 | | |
| | AYET EL-KURSÎ | 8 | 2 | Rezber |
| | ROLA XEDÎCE XANIM DI PIŞTGIRTIYA HZ. PÊXEMBER DE | 10 | 1 | Cotmeh |
| | SERKEFTINA MIN, MIN CIHÊWAZ DIKE | 13 | 1 | |
| | AŞTÎ OLA ME YE | 15 | 1 | |
| | BEŞÊN AVÊ | 18 | 1 | |
| | BEŞA DUYEM: | 21 | ..... | Mijdar |
| | EM CUDAHIYÊ NAXIN NAVBERA ŞANDERÊN XWEDA | 22 | 2 | |
| | DOZ DI NAVBERA RAZBÛN Û AŞKEREBÛNÊ DE | 25 | 1 | |
| | MERDÎ-ÇAVFIREHÎ | 27 | 1 | |
| | AVAKIRINA CÎHANÊ | 30 | 1 | Berfanbar |
| | DESTNIMÊJ | 32 | 1 | |
| | BEŞA SÊYEM | 35 | .... | |
| | SÛRET EL-DUHA | 36 | 2 | |
| | BAWERMENDÊN DESTPÊKÊ | 39 | 1 | Rêbendan |
| | Nirxandin û Navber | | | |
| | BI HEZKIRINÊ BAWERIYA ME SERGIHAYÎ DIBE | 41 | 1 | Reşemeh |
| Qonaxa Duyem | BI ZANÎNÊ EM GEŞ DIBIN | 43 | 1 | |
| | NIMÊJ Û MERCÊN WÊ | 45 | 1 | |
| | BEŞA ÇAREM | 47 | .... | |
| | MEZINBÛNA XWEDAYÊ PAYEBILIND | 48 | 2 | |
| | DIRUSTKARÎ | 51 | 1 | Adar |
| | BEXŞANDIN DI DEMA KARÎNÊ DE | 54 | 1 | |
| | SERDANA KESÊ NEXWEŞ | 56 | 1 | |
| | NIMÊJ Û HÎMÊN WÊ | 58 | 1 | |
| | BEŞA PÊNCEM | 61 | .... | Cotmeh |
| | SÛRET EL-XAŞIYA | 62 | 1 | |
| | EM BI HEV RE BIJÎN | 65 | 1 | |
| | BERPIRSYARÎ | 67 | 1 | |
| | Ê KU ME BIXAPÎNE NE JI ME YE | 69 | 1 | |
| | NIMÊJ (ŞKESTIN Û MEKROHIYÊN WÊ) | 72 | 1 | Gulan |
| | Nirxandin û Navber | | | |

# Beşa Yekem

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1. Ayetên pîroz bi rengekî rast bixwîne û wateyên peyvên wan, nas bike.
2. Taybetiyên Xwedayê payebilind, nas bike.
3. Rola jinê di piştgirtiya ola islamê de, nas bike.
4. Hewl bide ku di jiyana xwe de, mirovekî serkeftî be.
5. Rola isalmê di belavkirina aştiyê de, nas bike.
6. Beşên avê nas bike.

# 1 AYETA EL-KURSÎ

Qurana Pîroz

## Guhdarî bikim û bixwînim

قَالَ تَعَالَى: ﴿ٱللَّهُ لَآ إِلَٰهَ إِلَّا هُوَ ٱلۡحَيُّ ٱلۡقَيُّومُۚ لَا تَأۡخُذُهُۥ سِنَةٞ وَلَا نَوۡمٞۚ لَّهُۥ مَا فِي
ٱلسَّمَٰوَٰتِ وَمَا فِي ٱلۡأَرۡضِۗ مَن ذَا ٱلَّذِي يَشۡفَعُ عِندَهُۥٓ إِلَّا بِإِذۡنِهِۦۚ يَعۡلَمُ مَا بَيۡنَ أَيۡدِيهِمۡ
وَمَا خَلۡفَهُمۡۖ وَلَا يُحِيطُونَ بِشَيۡءٖ مِّنۡ عِلۡمِهِۦٓ إِلَّا بِمَا شَآءَۚ وَسِعَ كُرۡسِيُّهُ ٱلسَّمَٰوَٰتِ وَٱلۡأَرۡضَۖ
وَلَا يَـُٔودُهُۥ حِفۡظُهُمَاۚ وَهُوَ ٱلۡعَلِيُّ ٱلۡعَظِيمُ ٢٥٥﴾ البقرة [255]

## Rast bi lêv bikim:

{ٱلۡقَيُّومُ} {سِنَةٞ} {يَشۡفَعُ} {يَـُٔودُهُۥ}

## Çalakî

**a. Gotinên her du latikan bigihînim hev û wateyên wan tê bigihêjim:**

| | |
|---|---|
| Wî bê çare nake. | القيّوم |
| Bi ferman û razîbûna wî. | سِنَةٌ |
| Mayînde; yê ku tevdîra her tiştî dike. | بِإِذْنِهِ |
| Zanîna wî, her tiştî dihundirîne. | وَسِعَ |
| Xilmaşbûn | لا يؤده |

**b. Bixwînim û lihevhatinê pêk bînim:**

| Raman | | Rista quranî | |
|---|---|---|---|
| Parastina Xweda ji afrîdeyên xwe re. | 3 | لَّهُۥ مَا فِي ٱلسَّمَٰوَٰتِ وَمَا فِي ٱلۡأَرۡضِ | 1 |
| Xweda bi tenê, xwediyê her tiştî ye. | ... | يَعۡلَمُ مَا بَيۡنَ أَيۡدِيهِمۡ وَمَا خَلۡفَهُمۡ | 2 |
| Firehbûna zanîna Xweda. | ... | وَلَا يَـُٔودُهُۥ حِفۡظُهُمَاۚ وَهُوَ ٱلۡعَلِيُّ ٱلۡعَظِيمُ | 3 |

**Bixwînim û fêr bibim**

- Ayeta Kursiyê ji ayetên herî gewre yên Qurana Pîroz e.
- Ev ayet, navên Xweda, taybetî û kiryarên wî dihundirîne.
- Di vê ayetê de, nîşanên mezinbûna Xweda hene û ji wan nîşanan:
  - Xweda nakeve ber rêgeza xew û xilmaşbûnê.
  - Di gerdûnê de, tevdîra hemû tiştî bi destê Xweda ye.

**Ji waneyê fêr bibim**

**1. Bi tenê ricakarî bi destê Xweda û kesên ku Xweda destûra vê yekê daye wan e.**

**2. Mezin û Bilind, ji navên Xweda yên pîroz in.**

**3. ........................................................................**

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

Zana, yek ji taybetiyên Xweda ye. Bi malbata xwe re vê taybetiyê gotûbêj bikim û li lênûsa xwe binivîsim.

## 2 ROLA XEDÎCE XANIM DI PIŞTGIRTIYA HZ. PÊXEMBER DE

### Bixwînim û bersivê bidim

Xedîce Xanim, kesa yekem bû ku bawerî bi doza Hz. Pêxember anî. Gava Hz. Pêxember jê re dabaşa sirûşê kir, helwesta wê erênî bû û dilê Hz. Pêxember xweş kir. Ji bo ku bûyera Şkefta Herayê ji Wereqa Bin-Nofel (lawê apê Xedîceyê) re ragihînin, Xedîce Xanim û Hz. Pêxember çûn gel wî. Wereqa Bin-Nofel li ser ola Hz. `Îsa bû.

Wereqa Bin-Nofel ji Hz. Pêxember re got ku ew firşteyê ku sirûş ji te re anî xwarê, ew e heman firşteyê ku sirûş li ser Hz. Mûsa, anî xwarê. Wereqa Bin-Nofel dilê wî aram kir û gotinên wî bandoreke erênî li Hz. Pêxember kir.

- **Gava Hz. Pêxember ji Xedîce Xanim re, dabaşa daketina sirûşê kir, wê çawa alîkariya Hz. Pêxember kir?**
- **Li gorî têgihştina xwe ji deqê re, olên yekxwedayî (ezmanî) yên beriya islamê diyar bikim.**

### Bixwînim û fêr bibim

Ji destpêka dozê ve, rola jinê di ola islamê de ne kêmî rola mêr bû. Piştgirtiya Xedîce Xanim ji Hz. Pêxember re, nîşana herî mezin li ser vê yekê bû. Wê bi nêrîn, mal û keda xwe piştgirtiya Hz. Pêxember di dozê de dikir. Ew çêtirîn nimûneya hevjîna baş bû û di pey re weke dayîka bawrmendan jî roleke baş lîst. Xedîce Xanin di sala dehem a piştî şandetiyê de, koça dawî kir.

## Çalakî

Xedîce Xanim, di maleke xwedî kok û binyad de, mezin bibû û di vê malê de, li ser sincên herî pak û reftarên herî qenc rabibû. Ew jineke hişmend û xwedî kokeke resen bû.

- **Ji taybetiyên Xedîce Xanim (Xweda jê razî be):**
    1. **Pendyarî**
    2. **................**
    3. **................**
- **Di nava gelê xwe de, bi nasnavê................ dihat nasîn.**
- **Sala ku Xedîce Xanim tê de koça dawî kir, bi sala ................ hat binavkirin.**

## Bihizirim û encamê jê bigirim

Hz. Pêxember di derbarê Xedîce Xanim de, wiha got: «Gava mirovan baweriya xwe bi min nedianî, wê bawerî bi min anî. Dema ku xelkê ez derewîn derxistim, wê ji min bawer kir û dema mirovan ez ji malên xwe bê par hiştim, wê bi malên xwe li ber dilê min da»:

**1. Pêdan, bi rola Xedîce Xanim e.**

**2. ..................................................**

Ji waneyê fêr bibim

1. **Jin ji destpêka ola islamê ve, di berdewamkirina dozê de, beşdar bû.**
2. **Di dilê Hz. Pêxember de, Xedîce Xanim xwedî cihekî mezin bû.**

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

Xedîce Xanim, weke kesayet, rola wê di piştgirtiya Hz. Pêxember de, hebû. Ez vê yekê weke nimûne bigirim dest û bi mamosteyê xwe re, rola jinê ya li rex mêr di hemû qadên jiyanê de, gotûbêj bikim.

# 3 SERKEFTINA MIN, MIN CIHÊWAZ DIKE

Sinc

**Bixwînim û bersivê bidim**

Hz. Pêxember (silavên Xweda lê bin) got: «Li tiştên ku sûdê didin te, balder be, alîkariya Xweda bixwaze û bê çare nebe.»

- **Gotina Hz. Pêxember handana çi dike?**

**Bixwînim û fêr bibim**

**Serkeftin:** Tê wateya pêkanîna armancên ku mirov dane ber çavên xwe; dibe ku ev armanc, zanist, kar û bandorkirina li mirovan be.



### Çalakî

**Di cihên li jêr de, rêyên ku serkeftinê tînin, pêşniyar bikim:**

**1. Mal: Xurtkirina rêzdariyê.**

**2. Dibistan: ..................**

**3. Kar: ........................**

### Bihizirim û encamê jê bigirim

**Sekeftin ji bo kes û civakê gelek xêr û bêran tîne, ji berhemên serkeftinê:**

**1. Xwegihandina armancên destnîşankirî.**

**2. ................................................................**

**3. ................................................................**

### Ji waneyê fêr bibim

**1. Ji bo xwegihandina armancan, divê ez bi berdewamî kedê bidim.**

**2. Serkeftina min ji serkeftina civaka min e.**

**3. ................................................................**

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

Bi mamosteyê xwe re, di derbarê armanca ku min ew plan kiriye û rêyên pêkamîna wê de, gotûbêj bikim û di lênûsa xwe de, binivîsim.

# 4 AŞTÎ OLA ME YE

Sinc

**Bixwînim û bersivê bidim**

Ebdulah Bin `Emr Bin`As (Xweda ji wan razî be) got ku Pêxember got: «Misilman ew kesê ku misilman ji ziman û destên wî, ziyanê nabînin û kesê koçber ew kesê ku ji tiştên ku Xweda ew qedexe kirine, dûr dikeve.»

(Buxarî)

- **Tiştên ku gotina Hz. Pêxember raber dike, bi kurtî diyar bikim.**

**Bixwînim û fêr bibim**

**Aştî:** Rewşeke erênî ye; ew di nava civakan de aramî, tebat û hevjiyana biewle, pêk tîne.



**Bihizirim û encamê jê bigirim**

Di nava mirovahiyê bi tevahî de, aştî ji hîmên herî girîng e. Aştî, aramî û hedanê, xurt dike. Hemû ol, aştiyê weke hîmê herî girîng ji xwe re dibînin û li ser vê yekê, tekez dikin.

**Ji rêyên ku aştiyê bi cih dikin:**

**1. Rêzgirtina hemû baweriyan.**

**2. ...........................................**

**3. ...........................................**

**Çalakî**

Bixwînim û lihevhatinê di navbera helwest û encamê de, pêk bînim:

| Helwest | | Encam | |
|---|---|---|---|
| **Belavkirina hezkirinê di navbera mirovan de.** | **2** | Lawazbûna civakê û jihevketina wê. | **1** |
| **Gurkirina dijminahiyê di navbera mirovan de.** | **...** | Geşbûna civakê û bipêşketina wê. | **2** |
| **Pendyarî di girtina biryaran de.** | **...** | Di navbera endamên civakê de, rêzgirtin xurt dibe. | **3** |
| **Bi mirovan re, danûstandina binermî û sincî.** | **...** | Dûrketina ji pirsgirêkan. | **4** |

**Ji waneyê fêr bibim**

1. **Dûrketina ji gihandina ziyanê bo mirovên din, li ser me erk e.**
2. **Aştî, ewlehî û aramî ye.**
3. **.......................................**

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

Bi malbata xwe re, di derbarê bandora aştiyê li tebata mirov û civakê de, gotûbêjê bikim û li lênûsa xwe, binivîsim.

# 5 BEŞÊN AVÊ

Peristin

## Bixwînim û fêr bibim

قَالَ تَعَالَى: ﴿إِنَّ ٱللَّهَ يُحِبُّ ٱلتَّوَّٰبِينَ وَيُحِبُّ ٱلْمُتَطَهِّرِينَ ﴿٢٢٢﴾﴾ البقرة [222]

Pakbûn û paqijî, nîşaneya refatrekî şaristanî yê bipêşketî ye. Xweda ferman bi wan daye ku paqijî û pakbûn sedem û nîşaneya bawerî û hezkirina wî ye.

**Du cureyên pakbûnê hene:**

1. Pakbûna heyberî: Weke pakkirina cil, laş û cih.
2. Pakbûna darizandinî: Weke destnimêj û şûştinê û heke av peyda nebe, teyemûm (destnimêja bi axê) şûna wê digire.

## Bihizirim û encamê jê bigirim

قَالَ تَعَالَى: ﴿وَجَعَلْنَا مِنَ ٱلْمَآءِ كُلَّ شَيْءٍ حَيٍّ﴾ الأنبياء [30]

Av, bingeha hebûna her tiştî ye û xweşiyeke ji xweşiyên ku Xweda dane mirovan û bi rêya avê, mirov û erd pak dibin. Ji hêla pakbûnê ve, av li gorî xalên li jêr, tê dabeşkirin:

**1- Ava pakker:** Ew ava ku li ser xwezaya afirandina xwe maye; ew di hebûna xwe de, paqij e û tiştên din pak dike.

**Ji nimûneyên wê:**

1. Ava çeman
2. ..................
3. ..................

**Bikaranînên ava pakker:**

1. …………
2. **Destnimêj**
3. ………….
4. **Vexwarin**

**2- Ava pak:** Ew ava ku di bingeha xwe de paqij e, lê tiştên din pak nake.

**Mînak:**

1. **Ava ku hatiye bikaranîn mîna ava destnimêjê û şûştinê.**
2. **Ava ku têkelî tiştekî pak bûye û hin taybetiyên wê hatine guhartin.**

**Mînak:**

1. **Ava gulan**
2. …………..

**3- Ava qirêj:** Ew ava ku tiştekî qirêj têkelî wê bûye û hin taybetiyên wê mîna reng, çêj û hilmê hatine guhertin.

**Mînak:**

1. **Ava ku gubre ketiye nava wê.**
2. ………………………………..



Çalakî

**Bixwînim û ji hev cuda bikim:**

| Av | Beş | | |
|---|---|---|---|
| | Pakker | Pak | Qirêj |
| Ava kaniyê | | | |
| Ava mêweyan | | | |
| Ava avgîran | | | |

Ji waneyê fêr bibim

**1. Di gerdûnê de, av ji xweşiyên Xweda yê herî mezin e.**

**2. Di vexwarin û destnimêjê de, em ava pak bi kar tînin.**

**3. ................................................................................**

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

Bi hevalên xwe re, mijara bikaranîna avê di xwezayê de, bi rêya herî guncaw, gotûbêj bikim û vê yekê li lênûsa xwe, binivîsim.

## Beşa Duyem

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1. Ayetên pîroz bi rengekî rast bixwîne û wateyên peyvên wan nas bike.
2. Baweriya xwe bi hemû pêxember û şanderên Xweda, bîne.
3. Pêvajoyên doza islamê, nas bike û ji hev derxîne.
4. Girîngiya merdiyê, nas bike.
5. Rola xwe di pêşxistin û avakirina cîhanê de, nas bike.
6. Fêrî çawaniya destnimêjgirtinê, bibe.

Qurana Pîroz

# 1 EM CUDAHIYÊ NAXIN NAVBERA ŞANDERÊN XWEDA

## Guhdarî bikim û bixwînim

قَالَ تَعَالَى: ﴿ءَامَنَ ٱلرَّسُولُ بِمَآ أُنزِلَ إِلَيۡهِ مِن رَّبِّهِۦ وَٱلۡمُؤۡمِنُونَۚ كُلٌّ ءَامَنَ بِٱللَّهِ
وَمَلَـٰٓئِكَتِهِۦ وَكُتُبِهِۦ وَرُسُلِهِۦ لَا نُفَرِّقُ بَيۡنَ أَحَدٖ مِّن رُّسُلِهِۦۚ وَقَالُواْ سَمِعۡنَا
وَأَطَعۡنَاۖ غُفۡرَانَكَ رَبَّنَا وَإِلَيۡكَ ٱلۡمَصِيرُ ﴿٢٨٥﴾ لَا يُكَلِّفُ ٱللَّهُ نَفۡسًا إِلَّا وُسۡعَهَاۚ لَهَا مَا
كَسَبَتۡ وَعَلَيۡهَا مَا ٱكۡتَسَبَتۡۗ رَبَّنَا لَا تُؤَاخِذۡنَآ إِن نَّسِينَآ أَوۡ أَخۡطَأۡنَاۚ رَبَّنَا وَلَا
تَحۡمِلۡ عَلَيۡنَآ إِصۡرٗا كَمَا حَمَلۡتَهُۥ عَلَى ٱلَّذِينَ مِن قَبۡلِنَاۚ رَبَّنَا وَلَا تُحَمِّلۡنَا مَا
لَا طَاقَةَ لَنَا بِهِۦۖ وَٱعۡفُ عَنَّا وَٱغۡفِرۡ لَنَا وَٱرۡحَمۡنَآۚ أَنتَ مَوۡلَىٰنَا فَٱنصُرۡنَا عَلَى
ٱلۡقَوۡمِ ٱلۡكَٰفِرِينَ ﴿٢٨٦﴾﴾ البقرة [286-285]

## Rast bi lêv bikim:

{وَمَلَـٰٓئِكَتِهِۦ} {وَأَطَعۡنَا} {غُفۡرَانَكَ} {إِصۡرٗا}

## Çalakî

**a. Gotinên her du latikan bigihînim hev û wateyên wan tê bigihêjim:**

| Lêveger |
|---|
| Bexşandina te. |
| Karên ku tu dikarî bi wan rabî. |
| Westandin û giranî. |

| |
|---|
| وُسْعها |
| إِصْرًا |
| غُفْرانك |
| المَصِير |

**b. Bixwînim û lihevhatinê pêk bînim:**

| Raman | | Rista quranî | |
|---|---|---|---|
| Her mirov wê li ser tiştên ku kiriye (xêr-şer) bê sizakirin | 3 | لَا نُفَرِّقُ بَيْنَ أَحَدٍ مِّن رُّسُلِهِۦ | 1 |
| Mirovê misilman baweriya xwe bi hemû şanderan tîne. | ... | لَا يُكَلِّفُ ٱللَّهُ نَفْسًا إِلَّا وُسْعَهَا | 2 |
| Xweda barê ku zêdeyî hêza mirov be, lê nake. | ... | لَهَا مَا كَسَبَتْ وَعَلَيْهَا مَا ٱكْتَسَبَتْ | 3 |

**Bihizirim û encamê jê bigirim**

قَالَ تَعَالَى: ﴿ءَامَنَ ٱلرَّسُولُ بِمَآ أُنزِلَ إِلَيْهِ مِن رَّبِّهِۦ وَٱلْمُؤْمِنُونَۚ كُلٌّ ءَامَنَ
بِٱللَّهِ وَمَلَٰٓئِكَتِهِۦ وَكُتُبِهِۦ وَرُسُلِهِۦ﴾ البقرة[285]

**Ji hîmên baweriyê:**

**1. Bawerî bi Xweda.**

**2. ..............................**

**3. ..............................**

Ji waneyê fêr bibim

**1. Ez baweriya xwe bi hemû şanderên Xweda, tînim.**

**2. Xweda bar zêdeyî hêza mirov, lê nake.**

**3. ..............................................................**

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

قَالَ تَعَالَى: ﴿وَٱعۡفُ عَنَّا وَٱغۡفِرۡ لَنَا وَٱرۡحَمۡنَآ﴾ البقرة [286]

Bi hevalên xwe re, ayeta pîroz û çawaniya pêkanîna wê di jiyana piratîkî de, gotûbêj bikim.

# 2 DOZ DI NAVBERA RAZBÛN Û AŞKEREBÛNÊ DE

Jînenîgariya Pêxembertiyê

## Bixwînim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى: ﴿ يَٰٓأَيُّهَا ٱلۡمُدَّثِّرُ ۝١ قُمۡ فَأَنذِرۡ ۝٢ ﴾ المدثر [2-1]

Hz. Pêxember pabendî bi fermana Xweda kir û baldarî û bergiriyên xwe dikirin. Destpêkê, wî doza xwe ji mirovên Mekayê re aşkere nekir; Hz. Pêxember, kesên nêzî xwe û kesên cihê baweriyê vedixwendin, dozê. Vê pêvajoya razî, sê salan berdewam kir.

- **Ez ji pabendiya Hz. Pêxember bi fermana Xweda, çi encamê digirim?**

## Bihizirim û encamê jê bigirim

Hz. Pêxember û kesên bawermend, li mala Erqem a ku dûrî malên Mekayê bû bi dizî li hev diciviyan. Erqem, ji bo kirina nimêjê, fêrbûna Qurana Pîroz û wergirtina sirûşê ji ber Hz. Pêxember, mala xwe dabû wan. Bi vê yekê wan razbûna dozê, ji ber sedemên li jêr parast:

**1. Tirsa ji tundiya qureyşê.**

**2. ...............................**

## Bixwînim û bersivê bidim

Gava hejmara bawermendan gihişt 40 kesî, wan doza xwe aşkere kir û endamtiya xwe ya ji ola islamê re, diyar kir. Ji bûyerên ku guherîneke bingehîn di navbera doza razî û aşkera de çêkir, islambûna `Umer Bin El-Xetab bû. Ew beriya islambûna wî bi dijminahiya xwe ji Hz. Pêxember û islamê re, dihat naskirin.

- **Di wê pêvajoyê de, girîngiya islambûna `Umer Bin El-Xetab, diyar bikim.**

## Ji waneyê fêr bibim

1. **Tevî astengiyên ku di pêvajoya razî de hebûn, islamê encamên pir berhemdar bi dest xistin.**
2. **Ji sedemên serkeftina dozê, gavên birêkûpêk ên ku li pey hev hatin avêtin.**

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

Bi mamosteyê xwe re di derbarê kesayetên din ên ku bandora wan di serkeftina doza islamê de hebû, gotûbêj bikim û li lênûsa xwe binivîsim.

# 3 MERDÎ-ÇAVFIREHÎ

Sinc

**Bixwînim û bersivê bidim**

Hz. Pêxember got: «Kesê ku baweriya xwe bi Xweda û Roja Axretê tîne, bila ji mêvanê xwe re, merd be.»

Merdî sincekî pesindayî ye û pêxemberên Xweda pê dihatin nasîn û şanderên wî handana wê dikir. Mirovê ku bi merdiyê tê nasîn, ew bi rûmet û binyada qenc jî tê nasîn.

- **Merdbûna pêxemberan nîşana çi ye?**

**Bixwînim û fêr bibim**

**Merdî berovajî çavtengiyê ye;** ew tê wateya ku mirov bi derûniyeke razî, tiştekî sûdmend û rewa; çi heyberî be (mal û xwarin) û çi razberî be (zanist, danûstendina qenc), pêşkêşî mirovên dîtir bike.

Kesê merd, ew kesê xêrxwaz û xwedî dan e; ji taybetiyên wî, ew bi başî û baldariya li kesên din, tê nasîn.



## Bihizirim û encamê jê bigirim

Merdî sincekî giştî ye; ew bi tiştekî tenê sînordar nabe û gelek awayên wê hene; ji nimûneyê wê:

**1. Merdiya bi zanistê.**

**2. ........................**

**3. ........................**

**4. ........................**

## Çalakî

**Ez reftarên li jêr li gorî merdî û çavtengiyê, dabeş bikim:**

- Beyar, di kampaniyên mirovî yên ku alîkariya koçberan dikin de, beşdar dibe. **(……)**
- Aram, armanca wî berhevkirina mal e û alîkariya mirovan nake. **(……)**
- Bêrîvan, li gorî pêwîstiyê, pênûsa xwe dide hevalên xwe. **(……)**
- Hêlînê, hevala xwe hînî çarekirina giriftariya bîrkariyê, nekir. **(……)**

Ji waneyê
fêr bibim

**1. Mêvanperwerî ji taybetiya merdan e.**

**2. Merdî, taybetiya Xweda û şanderên wî ye.**

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

قَالَ تَعَالَى: ﴿وَلَا يَحۡسَبَنَّ ٱلَّذِينَ يَبۡخَلُونَ بِمَآ ءَاتَىٰهُمُ ٱللَّهُ مِن فَضۡلِهِۦ هُوَ خَيۡرٗا لَّهُمۖ بَلۡ هُوَ شَرّٞ لَّهُمۡ﴾ آل عمران [180]

Bi malbata xwe re, ayeta pîroz gotûbêj bikim û hin bandorên çavtengiyê li kesayeta mirov diyar bikim û vê yekê bi rengekî kurt li lênûsa xwe binivîsim.

# 4 AVAKIRINA CÎHANÊ

## Bixwînim û bersivê bidim

Enes Bin Malik (Xweda jê razî be) got: Pêxember (silavên Xwedê lê bin) got: «Heke Roja Axretê rabû û di destê kesekî ji we de, şitlek hebe, heke karibe wê şitlê biçîne berî ku qiyamet rabe, bila wê yekê bike.»

(Buxarî)

- **Hz. Pêxember di gotina xwe de bi awayekî giştî, doza çi li me dike?**

## Bixwînim û fêr bibim

Avakirina cîhanê, tê wateya ku mirov ji berhemên erdê, bêyî ku xerabiyê bike, sûdê bigire her weha ji bo hêsankirina jiyana mirovan, cîhanê xweş û çak bike.



### Çalakî

**Ez reftarên li jêr li gorî avakirin û xerakirinê, dabeş bikim:**

- Çandina gul û daran li gulîstanan. (.......)
- Avêtina gelaşan di cihên nedestnîşankirî de. (.......)
- Xerckirina avê li gorî pêwîstiyên xwe. (.......)
- Parastina raxerên dibistanê (mase, kursî). (.......)

### Bihizirim û encamê jê bigirim

Avakirina cîhanê, bi karê berdewam û bi rêya berhênana guncaw bêyî xerckirina zêde ya samanên jîngehî, pêk tê.

**Ji çareyên alîkar bi vê yekê re:**

1. **Parastina jîngehê ji bermahiyên kargeh û turimbêlan bi hemû cureyên wan.**
2. ........................
3. ........................

### Ji waneyê fêr bibim

1. **Avakirina cîhanê, ji temînên pêxemberan e.**
2. **Di parastina jîngeha xwe de, beşdar bibim.**
3. ..................................................................

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

Bi mamosteyê xwe re, di derbarê bandorên neyînî yên birrîna daran li ser jîngehê, gotûbêj bikim û bi kurtî li lênûsa xwe binivîsim.

## 5 DEStNIMÊJ

Peristin

**Bixwînim û fêr bibim**

**Destnimêj:** Bi niyaza peristinê, bi şêweyekî taybet pakkirina hin lebatên destnîşankirî ye.

**Bihizirim û encamê jê bigirim**

قَالَ تَعَالَى: ﴿يَٰٓأَيُّهَا ٱلَّذِينَ ءَامَنُوٓاْ إِذَا قُمۡتُمۡ إِلَى ٱلصَّلَوٰةِ فَٱغۡسِلُواْ وُجُوهَكُمۡ
وَأَيۡدِيَكُمۡ إِلَى ٱلۡمَرَافِقِ وَٱمۡسَحُواْ بِرُءُوسِكُمۡ وَأَرۡجُلَكُمۡ إِلَى ٱلۡكَعۡبَيۡنِ﴾
المائدة [6]

### Hîmên destnimêjê:

1. Niyaz
2. ……..
3. Şûştina destan heta enîşkan
4. ………………………………...
5. ...………………………………
6. Li gorî dûrêzkirina li jor, birêkûpêkkirina kiryarên destnimêjê

Çalakî

**Bixwînim û lihevhatinê pêk bînim:**

| Lebatên destnîşankirî | | Taybetiyên destnîşankirî | |
|---|---|---|---|
| Rû | ... | Mistdana serî. | 1 |
| Her du dest | 4 | Şûştina rû heta guhan. | 2 |
| Serê mirov | ... | Şûştina lingan heta gwîzekan. | 3 |
| Her du ling | ... | Şûştina destan heta enîşkan. | 4 |

Bixwînim û sergihayî bikim:

قَالَ تَعَالَى: ﴿أَوۡ جَآءَ أَحَدٞ مِّنكُم مِّنَ ٱلۡغَآئِطِ﴾ المائدة [6]

**Şikestinên destnimêjê:**

1. Razan

2. ........

Çalakî

قَالَ تَعَالَى: ﴿لَّا يَمَسُّهُۥٓ إِلَّا ٱلۡمُطَهَّرُونَ ٧٩﴾ الواقعة [79]

**Ji peristinên ku girêdayî destnimêjê ne:**

1. Gera li dora Ke`beyê.

2. ...................................

3. ...................................



**Ji waneyê fêr bibim**

**1. Ji bo gelek peristinan, destnimêj mercekî sereke ye.**

**2. Bi destnimêjê, paqijiya min a kesayetî zêde dibe.**

**3. .............................................................................**

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

Hz. Pêxember got: «Heke tu li ser çemekî bî jî, zêde avê xerc neke.»

Bi malbata xwe re, di derbarê girîngiya baldariya li xerckirina avê di dema destnimêjê de, gotûbêj bikim.

# Beşa Sêyem

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1. Ayetên pîroz bi rengekî rast bixwîne û wateyên peyvên wan, nas bike.
2. Cih û payeya Hz. Pêxember a li cem Xwedayê wî, nas bike.
3. Kesên destpêkê yên ku baweriya xwe bi ola islamê anîn, nas bike.
4. Rola hezkirinê di hevgirtina civakê de, nas bike.
5. Rola zanistê di avakirina mirov de, nas bike.
6. Mercên nimêjê bi bîr bîne.

# 1 SÛRET EL-DUHA



## Guhdarî bikim û bixwînim

بِسۡمِ ٱللَّهِ ٱلرَّحۡمَٰنِ ٱلرَّحِيمِ

﴿وَٱلضُّحَىٰ ١ وَٱلَّيۡلِ إِذَا سَجَىٰ ٢ مَا وَدَّعَكَ رَبُّكَ وَمَا قَلَىٰ ٣ وَلَلۡأٓخِرَةُ خَيۡرٞ لَّكَ
مِنَ ٱلۡأُولَىٰ ٤ وَلَسَوۡفَ يُعۡطِيكَ رَبُّكَ فَتَرۡضَىٰٓ ٥ أَلَمۡ يَجِدۡكَ يَتِيمٗا فَـَٔاوَىٰ ٦ وَوَجَدَكَ
ضَآلّٗا فَهَدَىٰ ٧ وَوَجَدَكَ عَآئِلٗا فَأَغۡنَىٰ ٨ فَأَمَّا ٱلۡيَتِيمَ فَلَا تَقۡهَرۡ ٩ وَأَمَّا
ٱلسَّآئِلَ فَلَا تَنۡهَرۡ ١٠ وَأَمَّا بِنِعۡمَةِ رَبِّكَ فَحَدِّثۡ ١١﴾ الضحى [11-1]

## Rast bi lêv bikim:

{وَمَا قَلَىٰ}　{وَلَلۡأٓخِرَةُ}　{فَـَٔاوَىٰ}　{عَآئِلٗا}　{فَحَدِّثۡ}

## Çalakî

**a. Gotinên her du latikan bigihînim hev û wateyên wan tê bigihêjim:**

| |
|---|
| Te xwedî kir. |
| Dema bilindbûna rokê. |
| Lêhilatin (pêrexeyidîn) |
| Xizan |
| Tarî bû û rawestiya. |

| |
|---|
| الضّحى |
| سجى |
| فآوى |
| عائلاً |
| تنهر |

**b. Bixwînim û lihevhatinê pêk bînim:**

| Raman | | Rista quranî | |
|---|---|---|---|
| Jiyana axiretê ji jiyana cîhanî çêtir e. | 3 | وَٱلضُّحَىٰ ۝١ وَٱلَّيۡلِ إِذَا سَجَىٰ | 1 |
| Xwedayê payebilind bi afrîdeyên xwe sûnd xwariye. | ... | مَا وَدَّعَكَ رَبُّكَ وَمَا قَلَىٰ | 2 |
| Xweda, ji Pêxemberê xwe re got ku ew ji wî hez dike û piştî ku wî ew nêzîkî xwe kir, wî dûr naxe. | ... | وَلَلۡأٓخِرَةُ خَيۡرٞ لَّكَ مِنَ ٱلۡأُولَىٰ | 3 |

**Bixwînim û sergihayî bikim**

Xweda ji bo ku Hz. Pêxember dilaram bibe û kêfxweşiyê têxe dilê wî û xemgîniyê jê derîne, Sûreta Duhayê daxiste ser wî û xweşiyên xwe dane wî, mîna:

**1. Piştî sêwîbûna wî, ew bi merdî û baldariya xwe şa kir.**

**2. ……………………………………………………………………….**

### Bixwînim û fêr bibim

**Di rêya sûreta pîroz re, Xweda hin temînî li Hz. Pêxember kirin:**

1. Têkiliya qenc bi her sêwiyî re bê kirin û bi bîr anî ku çawa Xweda têkiliya qenc bi wî re kiriye.
2. Mirov, bi ser kesên ku alîkariyê dixwazin (xwedî pêwîstî), de ranebe û di hemû tiştên ku dixwazin de, piştgirtiya wan bike.
3. Li hember xweşiyên ku Xweda dane me, spasdar bin û dabaşa wan xweşiyan bikin.

### Ji waneyê fêr bibim

**1. Cihê Hz. Pêxember, li gel Xweda cihekî mezin e.**

**2. ........................................................................................**

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

Hz. Pêxember got: «Xwedayê min ez bi tore kirim; wî baş ez bi tore kirim.»

Bi mamosteyê xwe re, gotina Hz. Pêxember gotûbêj bikim û cihên ku ev gotin (gotina Hz. Pêxember) û ayeta bûrî, tê de li hev tên (xalên hevbeş) diyar bikim.

# 2 BAWERMENDÊN DESTPÊKÊ

Jînenîgariya Pêxembertiyê

**Bixwînim û bersivê bidim**

Kesên ku derbasî islamê bûn, li gorî temenên xwe cihêreng bûn; zarok, jin û mêr bûn. Her weha di bilindkirina gotina Xweda û piştgirtiya Hz. Pêxember de, xwedî roleke mezin bûn û gelek cangorî dan. Ji bo biserketina islamê, hinan ji wan tevahiya malên xwe û hinan jî ked û nêrînên xwe, pêşkêş kirin.

- Di piştgirtiya islamê de, girîngiya cihêrengiya mirovên ku derbasî isalmê bûn, diyar bikim.
- Ji kesên ku destpêkê derbasî islamê bûn:

**Ji mêran:**

**1. Ebû Bekir El-Sidîq**

**2. ................................**

**Ji jinan:**

**1. ...............**

**Ji zarokan:**

**1. ...............**

**Bixwînim û sergihayî bikim**

Ji ber erêniyên ku di naveroka doza islamê de hatin dîtin, nifşên xortan bi hişmendiya xwe, yên herî nêzîkî doza islamê bûn, ji wan erêniyan:

**1. Isalmê kevneşopiyên xirab, rakirin.**

**2. ..........................................................**

**3. ..........................................................**

**Ji waneyê fêr bibim**

**1. Nameya islamê ji bo hemû mirovahiyê, nameyeke giştî ye.**

**2. ......................................................................................................**

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

Rola heval û hogirên Hz. Pêxember (mêr-jin) di avakirina civakê de û guhertina wê ber bi başiyê ve pir mezin bû.

Ji bo guhertina rewşa me ya niha û pêşeroja me, girîngiya hevgirtinê diyar bikim.

# 3 BI HEZKIRINÊ BAWERIYA ME SERGIHAYÎ DIBE

Sinc

**Bixwînim û bersivê bidim**

Pêxemberê Xweda got: «Tu kes ji we nabe bawermend, heta ku wekî ji xwe re dixwaze wisa ji birayê xwe re jî bixwaze.»

- **Bawerî li gorî gotina Hz. Pêxember, bi çi ve hatiye girêdan?**

**Bixwînim û fêr bibim**

Hezkirin sayek e, ew mirov ber bi xêrxwazî û baldariya bi kesên din ve dibe. Her weha girêdaneke pir xurt a hezkirinê, bi karê çak ve heye.

Ji nimûneyên hezkirinê: Hezkirina Xweda, hezkirina Hz. Pêxember û hezkirina endamên civakê ji hev re ye.



## Bixwînim û sergihayî bikim

Hz. Pêxember got: «Dexsiyan li hev nekin, kîna hev nekşînin û weke peristkerên Xweda bibin birayên hev.»

Girîngiya hezkirinê pir heye û bandorên wê yên erênî li ser kes û civakan pir hene û ji wan bandoran:

**1. Derûniyê ji kînê paqij dike.**

**2. Hogirtiyê di nava civakê de, xurt dike.**

**3. ……………………………………………………………**

**4. ……………………………………………………………**

## Çalakî

**Reftarên li jêr li gorî tiştên ku raber dikin (hezkirin û kînê) dabeş bikim:**

- Serdar, alîkariya mirovan dike û di avakirina gundê xwe de, beşdar dibe. **(……)**
- Warvîn ji bo serkeftina hevala xwe, lavayan dike. **(……)**
- Rênas, bi niyaza gihandina ziyanê, cama pencereya cîranê xwe, şkand. **(……)**

## Ji waneyê fêr bibim

**1. Hezkirina rast, bingeha baweriyê ye.**

**2. Bi hezkirinê, em welatekî biewle, ava dikin.**

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

Ji afrîneriya xwe, di derbarê hezkirinê de helwestekê ava bikim û hestên xwe tê de diyar bikim û vê yekê li lênûsa xwe, binivîsim.

# 4 BI ZANÎNÊ EM GEŞ DIBIN

Sinc

**Bixwînim û bersivê bidim**

Ebû Hûreyra (Xweda jê razî be) got: Hz. Pêxember got: «Kesê ku bi mebesta wergirtina zanistê bide ser rêyekê, Xweda rêya bihuştê jê re hêsan dike.»

(Muslim)

- **Li gorî têgihiştina min ji gotina Hz. Pêxember re, girîngiya daxwaza zanistê, diyar bikim.**

**Bixwînim û fêr bibim**

Zanîn rêyek e, ew mirov digihîne rastiya tiştan; ew rêya rast a ku mirov ji tarîtiya nezaniyê ber bi ronahiya zanînê ve dibe. Zanîn, raza pêşketina mirovahiyê ye.



**Bixwînim û sergihayî bikim**

قَالَ تَعَالَى: ﴿يَرۡفَعِ ٱللَّهُ ٱلَّذِينَ ءَامَنُواْ مِنكُمۡ وَٱلَّذِينَ أُوتُواْ ٱلۡعِلۡمَ دَرَجَٰتٖ﴾ المجادلة [11]

Xweda cihekî berz daye zanîn û zanyaran û di hemû qadan de, handana me li ser zanînê kiriye:

**Ji qadên zanistê:**

**1. Zanistên olî.**

**2. ……………………**

**3. ……………………**

**Bixwînim û sergihayî bikim**

Ji ber ku zanist gelek encamên bisûd ji bo kes û civakê bi xwe re tîne, girîngdayîna bi zanistê bendoreke mezin li jiyana mirovan dike. Ji van sûdan:

**1. Pêşketina zanistên bijîşkiyê.**

**2. ……………………………………**

**3. ……………………………………**

**Ji waneyê fêr bibim**

**1. Daxwaza zanistê ferz e.**

**2. Zanist ronahî ye û nezanî tarîtî ye.**

**3. ……………………………………………………**

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

Bi mamosteyê xwe re, di derbarê keysbazîkirina zanistê, di roja me ya îro de û encamên wê yên neyînî de, gotûbêj bikim û li lênûsa xwe, binivîsim.

5 **NIMÊJ Û MERCÊN WÊ** Peristin

**Bixwînim û bersivê bidim**

قَالَ تَعَالَى: ﴿فَأَقِيمُوا۟ ٱلصَّلَوٰةَۚ إِنَّ ٱلصَّلَوٰةَ كَانَتْ عَلَى ٱلْمُؤْمِنِينَ كِتَـٰبًا مَّوْقُوتًا ﴿١٠٣﴾﴾
النساء [103]

**Nimêj:** Tê wateya lavayê. Ew gotin û karên ku bi tekbîrê dest pê dikin û bi silavdayînê bi dawî dibin û li gorî mercên taybet û demên destnîşankirî, pêk tên.

**Fêr bibim û bersivê bidim**

**Mercên nimêjê:**

1. **Paqijiya gewd, cil û cih.**
2. **Nixumandina gewde.**
3. **Berîdana Ke`beyê.**
4. **Dem.**

**Mercên ku nimêjê dikin erk:**

1. **Islam**
2. **Gihiştbûn**
3. **…………..**

## Çalakî

**Bigihînim hev û demên her pênc nimêjan, nas bikim:**

| Dem |
|---|
| Di navbera bidawîbûna nîvro û roavayê de, sînordar e. |
| Ji roavayê dest pê dike û bi windabûna şefeqê (sorbûna ku piştî roavayê çêdibe) bi dawî dibe. |
| Ji dema ku roj nêvî dibe, heta `esrê sînordar e. |
| Ji spîdeyê heta beriya derketina rokê, sînordar e. |
| Ji windabûna şefeqa sor heta hilbûna spîdeya rastîn, sînordar e. |

| Nimêj |
|---|
| Sibeh |
| Nîvro |
| esir |
| Muxrib |
| eşa |

## Ji waneyê fêr bibim

1. Nimêj li ser her misilmanî ferz e.
2. Di rojê de (şev û roj) pênc caran, nimêjê dikim.
3. ..........................................................................................

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

قَالَ تَعَالَى: ﴿يَٰبَنِيٓ ءَادَمَ خُذُواْ زِينَتَكُمۡ عِندَ كُلِّ مَسۡجِدٖ﴾ الأعراف [31]

Bi mamosteyê xwe re, di derbarê vê ayeta li jor de ku çiqasî girêdana wê bi mercên nimêjê re heye, gotûbêj bikim.

## Beşa çarem

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1. **Ayetên pîroz bi rengekî rast bixwîne û wateyên peyvên wan, nas bike.**
2. **Di gerdûnê de, diyardeyên mezinbûna Xwedayê payebilind, nas bike.**
3. **Girîngiya şarezabûna di kar de, nas bike.**
4. **Di helwestên ku bexşandinê dixwazin de, bexşîner be.**
5. **Toreyên serdana kesên nexweş, nas bike.**
6. **Hîmên nimêjê, bi bîr bîne.**

Qurana Pîroz

# 1 MEZINBÛNA XWEDAYÊ PAYEBILIND

## Guhdarî bikim û bixwînim

قَالَ تَعَالَى: ﴿ٱلرَّحۡمَٰنُ ١ عَلَّمَ ٱلۡقُرۡءَانَ ٢ خَلَقَ ٱلۡإِنسَٰنَ ٣ عَلَّمَهُ ٱلۡبَيَانَ ٤ ٱلشَّمۡسُ
وَٱلۡقَمَرُ بِحُسۡبَانٖ ٥ وَٱلنَّجۡمُ وَٱلشَّجَرُ يَسۡجُدَانِ ٦ وَٱلسَّمَآءَ رَفَعَهَا وَوَضَعَ ٱلۡمِيزَانَ ٧
أَلَّا تَطۡغَوۡاْ فِي ٱلۡمِيزَانِ ٨ وَأَقِيمُواْ ٱلۡوَزۡنَ بِٱلۡقِسۡطِ وَلَا تُخۡسِرُواْ ٱلۡمِيزَانَ ٩ وَٱلۡأَرۡضَ
وَضَعَهَا لِلۡأَنَامِ ١٠ فِيهَا فَٰكِهَةٞ وَٱلنَّخۡلُ ذَاتُ ٱلۡأَكۡمَامِ ١١ وَٱلۡحَبُّ ذُو ٱلۡعَصۡفِ وَٱلرَّيۡحَانُ
١٢ فَبِأَيِّ ءَالَآءِ رَبِّكُمَا تُكَذِّبَانِ ١٣﴾ الرحمن [13-1]

**Rast bi lêv bikim:**

{بِحُسۡبَانٖ} {أَلَّا تَطۡغَوۡاْ} {بِٱلۡقِسۡطِ} {لِلۡأَنَامِ} {ءَالَآءِ}

## Çalakî

**a. Gotinên her du latikan bigihînim hev û wateyên wan tê bigihêjim:**

| | |
|---|---|
| البَيان | Afrîde |
| بحُسبان | Qaşil |
| الأَنام | Bilêvkirin û xweşbêjî |
| الأكمام | Şînkahiyeke bêhnxweş e. |
| العَصف | Li gorî sîstemeke destnîşankirî ye. |
| الرّيحان | Qalikê xurmeyê |

**b. Bixwînim û lihevhatinê pêk bînim:**

| Raman | | Rista quranî | |
|---|---|---|---|
| Erd xistiye bin rajeya afrîdeyan. | 2 | وَأَقِيمُواْ ٱلْوَزْنَ بِٱلْقِسْطِ وَلَا تُخْسِرُواْ ٱلْمِيزَانَ | 1 |
| Hûn kîjan xweşiyan mandele dikin? | ... | وَٱلْأَرْضَ وَضَعَهَا لِلْأَنَامِ | 2 |
| Pabendiya bi dadmendiyê. | ... | فَبِأَيِّ ءَالَآءِ رَبِّكُمَا تُكَذِّبَانِ | 3 |

### Bixwînim û fêr bibim

1. Her tiştên ku di gerdûnê de hene, ji bo rajeya mirov in.
2. Xweda ziman daye mirov ji bo ku bi birayê xwe yê mirov re, danûstandinê bike.
3. Pêkanîna dadmendiyê ji girîngtirîn nameyên asîmanî ye.
4. Afrandina mirov, erd, stêrk û cureyên berheman, ji diyardeyên şiyana Xweda ye.

### Çalakî

**Valahiyên ristên quranî bi peyvên guncaw dagirin:**

﴿وَٱلْأَرْضَ .......... لِلْأَنَامِ ١٠ فِيهَا .......... وَٱلنَّخْلُ ذَاتُ ٱلْأَكْمَامِ ١١ وَٱلْحَبُّ ذُو..........
وَٱلرَّيْحَانُ ١٢ فَبِأَيِّ ءَالَآءِ رَبِّكُمَا .......... ١٣﴾ الرحمن [13-10]

**Ji waneyê fêr bibim**

1. **Nirxdayîna xweşiyên Xweda, ji erkê mirov e.**
2. **Dadmendî bingehê hevgirtina civakan e.**
3. **.....................................................................**

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

Ziman, ji girîngtirîn navgînên danûstand û hevnaskirinê ye. Vê mijarê bi mamosteyê xwe re, gotûbêj bikim û bi sê xêzan li lênûsa xwe binivîsim.

# 2 DIRUStKARÎ

Sinc

**Bixwînim û bersivê bidim**

Hz. Pêxember got: «Xweda hez dike dema ku yek ji we karekî bike, wî karî bi dirustî pêk bîne».

(Musilm)

- **Gotina Hz. Pêxember (Xweda jê razî be) handana me li ser çi dike?**

**Bixwînim û fêr bibim**

Dirustkarî, tê wateya kar bi hûrbînî, bi rengekî sergihayî û bi şêweyê ku tê xwestin, pêk bê.



Çalakî

**a. Di cihên li jêr de, şîreta guncaw pêşkêş bikim:**

- Xwendekarek bê sedem gelek caran ji dibistana xwe dimîne.
  **Jê re dabaşa sûdên zanistê bikim û şîreta pabendiyê lê bikim**
- Karkerê avakirinê, heyberên avakiriné yên bingehîn kêm dike.
  ..............................................................................
- Ajokarek, qayîşa ewlehiyê girê nade.
  ..............................................................................

**b. Bixwînim û lihevhatinê pêk bînim:**

| Pîşe | | Rûyê Pisporiyê | |
|---|---|---|---|
| **Cotyar** | 3 | Her dem ji bo tiştên awarte amade be. | 1 |
| **Bijîşk** | ... | Mafê wanedayînê bide. | 2 |
| **Karkerê agirkujiyê** | ... | Baldariyê bide başbûna berhemê. | 3 |
| **Mamoste** | ... | Hêza xwe bi tevahî, di dermankirina nexweşan de, bi kar bîne. | 4 |

## Bixwînim û sergihayî bikim:

قَالَ تعَالَى: ﴿مَنْ عَمِلَ صَٰلِحًا مِّن ذَكَرٍ أَوْ أُنثَىٰ وَهُوَ مُؤْمِنٌ فَلَنُحْيِيَنَّهُۥ حَيَوٰةً طَيِّبَةً ۖ وَلَنَجْزِيَنَّهُمْ أَجْرَهُم بِأَحْسَنِ مَا كَانُوا۟ يَعْمَلُونَ ﴿٩٧﴾﴾ النحل [97]

Gava mirov karekî dike û di wî karî de pispor be û bi rengekî sergihayî wî pêk tîne, sûdên vê yekê li mirov û civakê hene û ji wan sûdan:

**1. Jiyana birûmet û biewle dabîn dibe.**

**2. ……………………………………………………………**

**3. ……………………………………………………………**

## Ji waneyê fêr bibim

**1. Di kirina erkê xwe de, mirov ne xemsar be.**

**2. Pisporiya di kar de, civakê bi pêş dixe.**

**3. ……………………………………………………………**

### Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:

Hin mirov bi behaneya piştgirêdana bi mirovên din (tewekilê) dev ji karê xwe berdidin. Ez ê vê yekê bi mamosteyê xwe re, gotûbêj bikim û bi kurtî li lênûsa xwe, binivîsim.

# 3 BEXŞANDIN DI DEMA KARÎNÊ DE

Sinc

**Bixwînim û bersivê bidim**

قَالَ تَعَالَى: ﴿فَٱعْفُ عَنْهُمْ وَٱصْفَحْ إِنَّ ٱللَّهَ يُحِبُّ ٱلْمُحْسِنِينَ ١٣﴾ المائدة [13]

- **Di ayeta pîroz de, Xwedayê payebilind handana me li ser çi dike?**

**Bixwînim û fêr bibim**

Bexşandin, tê wateya ku em li kesên ku di mafê me de şaş bûne, biborînin û wan siza nekin.



### Çalakî

**Reftarên xwe di helwestên li jêr de, diyar bikim:**

- Hevalê min pênûsa min şkenand.

  ...............................................

- Hevala min navekî ku ez jê tengezar dibim, li min kir.

  ...............................................

- Dema ku me bi goga pêyan dilîst, hevalê min ez xistim erdê.

  ...............................................

### Bixwînim û sergihayî bikim

Bexşandin, di nav endamên civakê de, hezkirin û dilovaniyê belav dike û gelek pirsgirêkên civakî çare dike. Ji tiştên ku bexşand wan xurt dike:

**1. Destpêşxiriya di lihevanînê de.**

**2. ..........................................................**

**3. ..........................................................**

### Ji waneyê fêr bibim

**1. Gava hevalê min di mafê min de şaş bibe, ez ê wî bibexşînim.**

**2. Bexşandin, ji taybetiya merdan e.**

### Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:

Bi hevalên xwe re, di derbarê helwestên bexşandinê yên ku bi me re derbas bûne de, gotûbêjê bikim û li lênûsa xwe binivîsim.

# 4 SERDANA KESÊ NEXWEŞ

Sinc

**Bixwînim û bersivê bidim**

Hz. Pêxember got: «Kesê ku serdana kesekî nexweş an serdana birayekî xwe bike, bangkerek bang wî dike, xweşî li te û li rêveçûna te be, cihekî te di buhiştê de, çêbû.»

(Buxarî)

- **Hz. Pêxember di gotina xwe de, handana me li ser çi dike?**

**Bixwînim û fêr bibim**

**Serdana kesê nexweş:** Mirov bi egera nexweşiyê û bi mebesta naskirina rewşê û rakirina moralan, venerîna heval, hogir an xizmên xwe bike.



### Bixwînim û sergihayî bikim

Ji serdana kesên nexweş re, hin tore hene, divê mirov pabendiyê bi wan bike û heke pabendiyê neke, wê hin bandorên neyînî li kesê nexweş bibin û ji wan toreyan:

**1. Destîşankirina dema guncaw.**

**2. ...........................................**

**3. ............................................**

### Çalakî

**Ji rewşên li jêr re, çareyên guncaw pêşniyar bikim:**

- Nexweşê ku ji bo xwedermankirinê pêwîstiya wî bi diravan heye.

  ........................................................................

- Nexweşê ku ji ber nexweşiya xwe, reşbîn be.

  ........................................................................

- Nexweşê ku ji qerebalixê tengezar dibe

  ........................................................................

### Ji waneyê fêr bibim

**1. Serdana kesê nexweş, li ser milê kesê misilman, erk e.**

**2. Ez pabendiyê bi toreyên serdana kesê nexweş dikim.**

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

Bi mamosteyê xwe re di derbarê girîngiya serdana kesê nexweş û rêyên alîkarê de, gotûbêj bikim û vê yekê bi kurtî li lênûsa xwe, binivîsim.

## 5 NIMÊJ Û HÎMÊN WÊ

Peristin

**Bixwînim û bersivê bidim**

قَالَ تَعَالَى: ﴿وَأَقِمِ ٱلصَّلَوٰةَۖ إِنَّ ٱلصَّلَوٰةَ تَنْهَىٰ عَنِ ٱلْفَحْشَآءِ وَٱلْمُنكَرِۗ﴾

[45] العنكبوت

- **Bi alîkariya mamosteyê xwe bandora nimêjê di pakkirina derûniyê û sererastkirina reftaran de, diyar bikim.**

**Bixwînim û fêr bibim**

**Hîmên nimêjê:** Ew kiryar û gotinên destnîşankirî ne ku bêyî yekî ji wan, nimêj nayê pejirandin.

**Hîmên nimêjê:**

**1. Niyaz**

**2. Tekbîra destpêka nimêjê.**

**3. Rabûn.**

**4. Xwendina Fatîheyê.**

**5. Xûlbûn**

**6. Daqûlbûn û rabûna jê.**

**7. Rûniştina di navbera her du daqûlbûnan de.**


**8. Daqûlbûna baweranîna dawî.**

**9. Silavdayîn**


**10. Aramî di hemû cihên bûrî de.**

## Çalakî

**Hîmê ku wêne raber dike, binivîsim.**



..................



..................



..................



..................



..................



..................



..................

Ji waneyê fêr bibim

**1. Pabendiyê bi hîmên nimêjê bikim; ji ber ku bê wan, nimêja min dirust nabe.**

**2. ..............................................**

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

Bi mamosteyê xwe re, di derbarê bandora nimêjê li sererastkirina reftarê kesê nimêjker de, gotûbêjê bikim û van agahiyan, bi sê xêzan li lênûsa xwe binivîsim.

# Beşa Pêncem

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1. **Ayetên pîroz bi rengekî rast bixwîne û wateyên peyvên wan, nas bike.**
2. **Girîngiya jiyana hevbeş û rola wê di avakirina civakê de, nas bike.**
3. **Di jiyana xwe de, bi hestê berpirsyariyê tev bigere.**
4. **Neyînî û bandorên xapandinê li civakê, nas bike.**
5. **Şkestin û mekrohiyên nimêjê, bi bîr bîne.**

# 1 SÛRET EL-XAŞIYA

Qurana Pîroz

## Guhdarî bikim û bixwînim

قَالَ تَعَالَى: ﴿أَفَلَا يَنظُرُونَ إِلَى ٱلۡإِبِلِ كَيۡفَ خُلِقَتۡ ١٧ وَإِلَى ٱلسَّمَآءِ كَيۡفَ رُفِعَتۡ ١٨ وَإِلَى ٱلۡجِبَالِ كَيۡفَ
نُصِبَتۡ ١٩ وَإِلَى ٱلۡأَرۡضِ كَيۡفَ سُطِحَتۡ ٢٠ فَذَكِّرۡ إِنَّمَآ أَنتَ مُذَكِّرٞ ٢١ لَّسۡتَ
عَلَيۡهِم بِمُصَيۡطِرٍ ٢٢ إِلَّا مَن تَوَلَّىٰ وَكَفَرَ ٢٣ فَيُعَذِّبُهُ ٱللَّهُ ٱلۡعَذَابَ ٱلۡأَكۡبَرَ ٢٤ إِنَّ
إِلَيۡنَآ إِيَابَهُمۡ ٢٥ ثُمَّ إِنَّ عَلَيۡنَا حِسَابَهُم ٢٦﴾ الغاشية [26-17]

## Rast bi lêv bikim:

{خُلِقَتۡ} {نُصِبَتۡ} {مُذَكِّرٞ} {إِيَابَهُمۡ}

## Çalakî

**a.** Gotinên her du latikan bigihînim hev û wateyên wan tê bigihêjim:

| |
|---|
| Desthilatdar û zordar e. |
| Piştî mirinê, vegera wan li jiyanê. |
| Bilindbûna çiya û xwecihiya çiya ji erdê re, nîşan dike. |
| Rast bû û ji bo niştecihbûnê, guncaw bû. |
| Berê xwe guherî û ew paşguh kir. |

| |
|---|
| نُصِبَتۡ |
| سُطِحَتۡ |
| بمصيطر |
| تولّى |
| إيابهم |

**b. Bixwînim û lihevhatinê pêk bînim:**

| | Rista quranî | | Raman |
|---|---|---|---|
| 1 | أَفَلَا يَنظُرُونَ إِلَى ٱلۡإِبِلِ كَيۡفَ خُلِقَتۡ | ... | Veger li Xweda ye. |
| 2 | لَّسۡتَ عَلَيۡهِم بِمُصَيۡطِرٍ | ... | Sûnda Xweda bi afrîdeyên xwe. |
| 3 | إِنَّ إِلَيۡنَآ إِيَابَهُمۡ | 2 | Zor neyê bikaranîn. |

**Bixwînim û sergihayî bikim**

قَالَ تَعَالَى: ﴿فَذَكِّرۡ إِنَّمَآ أَنتَ مُذَكِّرٞ ﴿٢١﴾ لَّسۡتَ عَلَيۡهِم بِمُصَيۡطِرٍ ﴿٢٢﴾﴾ الغاشية [22-21]

Xweda ji Hz. Pêxember re li ser wê yekê tekez dike ku tu desthilat û serdestiya wî li wan tune ye ku wan bi zorê bîne ser baweriyê. Ji ber ku erka wî:

**1. Nameya ola islamê ji mirovan re ragihîne.**

**2. ..............................................................................**

**Çalakî**

Xweda ferman li me kiriye ku em li ser ayetên wî yên di vê gerdûnê de hene, bihizirin. Li hember her ayeteke ku mezinbûna Xweda raber dike, awayê karîna Xweda binivîsim.

| Ayeta ku Xweda ferman li me kiriye ku em tê de bihizirin | Awayê karînê |
|---|---|
| Hêştir | Afrînerî û teşeyê wê. |
| Asîman | Bilindbûna wî. |
| Erd | ........................ |
| Çiya | ........................ |

**Ji waneyê fêr bibim**

**1. Li her derê ayetên Xweda hene.**

**2. Bibîranîn, sûdê dide bawermendan.**

**3. ........................................................**

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

Gelek navgînên nûjen di jiyana me ya îro de hene ku em dikarin di rêya wan re ayetên Xweda û mezinbûna afrîneriya wî nas bikin.

Di derbarê du navgînên nûjen de, mijarekê binivîsim.

# 2 EM BI HEV RE BIJÎN

Sinc

**Bixwînim û bersivê bidim**

Hz. Pêxember got: «Gelî mirovan, Xwedayê we yek e û bavê we yek e, ji bilî xwedatirsiyê saya kesê ereb li ser kesê neereb tune ye û saya kesê neereb li ser kesê ereb tune ye.»

- **Hz. Pêxember di gotina xwe de, handana me li ser çi dike?**

**Bixwînim û fêr bibim**

**Pevrejiyan:** Tê wateya ku mirov bi hev re bi awayekî wekhev bijîn bêyî ku ol, netewe û girêdanên din li hember vê pevrejiyanê, bibin rêgir her weha taybetiyên cuda yên her yekî ji wan bêne parastin.



## Çalakî

**Di derbarê tiştên li jêr de, helwesta xwe diyar bikim:**

- Olên din

  ..........................

- Neteweyên din

  ..........................

- Nêrînên din

  ..........................

## Bixwînim û sergihayî bikim

قَالَ تَعَالَى: ﴿وَجَعَلۡنَٰكُمۡ شُعُوبٗا وَقَبَآئِلَ لِتَعَارَفُوٓاْ﴾ الحجرات (13)

Ji lihevkirina endamên civakê gelek sûd der tên, ji wan sûdan:

**1. Parstina aştiya civakî pêk tê.**

**2. ..................................................**

**3. ..................................................**

## Ji waneyê fêr bibim

**1. Pevrejiyan di navbera mirovan de, kîn û tengezariyê radike.**

**2. Mafên xwe nas dikim û erkên xwe pêk tînim.**

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

Bi mamosteyê xwe re, di derbarê hin nimûneyên din ên pevrejiyanê de, gotûbêjê bikim û li lênûsa xwe, binivîsim.

# 3 BERPIRSYARÎ

Sinc

Bixwînim û bersivê bidim

Hz. Pêxember got: «Her kes berpirsyar e û ji her tişên ku pê ve girêdayî ne, berpirsyar e.»

- **Hz. Pêxember di nava gotina xwe de, nîşeyê bi çi dike?**

Bixwînim û fêr bibim

**Berpirsyarî:** Tê wateya ku mirov di jiyanê de, bi rola xwe rabe û karên ku ji bo wî hatine spartin, bi rengekî herî nimûneyî pêk bîne û ji hemû encamên ku ji ber wî karî der tên, berpirsyar be.



Çalakî

**Bixwînim û lihevhatinê pêk bînim:**

| Ji nimûneyên berpirsyariyê | | Çawaniya pêkanîna wê | |
|---|---|---|---|
| **Berpirsyariya li hember welatê xwe.** | ... | Alîkariya endamên malbatê. | **1** |
| **Berpirsyariya li hember mala xwe.** | **3** | Parastina raxeran. | **2** |
| **Berpirsiya li hember dibistana xwe.** | ... | Pabendiya bi rajeya welat. | **3** |

Bixwînim û sergihayî bikim

Dema ku mirov bi berpirsyariyên xwe radibe, kesayeta mirov xurt dibe û sûdê ji serboriyên xwe digire û di nava civakê de, dibe xwedî nirx.

**Ji sûdên pabendiya mirov bi berpirsyariyê re:**

**1. Baweriya mirov bi kesayeta wî xurt dibe.**

**2. Kar bi awayê herî baş pêk tê.**

**3. ………………………………………**

Ji waneyê fêr bibim

**1. Em bi berpirsyariyê, tiralî û bêhêvîtiyê têk dibin.**

**2. ………………………………………………………………………**

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

Di civakê de, dema ku hemû endam pabendiyê bi berpirsyariyên xwe bikin, wê encamên vê yekê çi bin?
Ez ê vê yekê şîrove bikim û li lênûsa xwe, binivîsim.

4

# Ê KU ME BIXAPÎNE NE JI ME YE

Sinc

## Bixwînim û bersivê bidim

Ebû Hûreyra (Xweda jê razî be) got: «Hz. Pêxember di ber firoşkarekî re derbas bû û li pêşiya wî firoşkarî hin xwarinên firotinê hebûn. Hz. Pêxember dest da xwarina wî firoşkarî; tiliyên wî ji wê xwarinê şil bûn. Hz. Pêxember got: Xwediyê xwarinê! Ev çi ye?

Xwediyê xwarinê got: Pêxemberê Xweda, baranê lê kiriye.

Hz. Pêxember got: Ma te nikarîbû ew beşa şilkirî, danîba ser rûyê xwarinê da ku mirov bibînin; ê ku xapandinê bike, ne ji me ye.»

- **Hz. Pêxember çi şîret li firoşkar kir?**

## Bixwînim û fêr bibim

**Xapandin:** Tê wateya ku mirov ji bo bidestxistina hin qezencan, rêyên nerewa bi kar bîne.



## Çalakî

**Di derbarê tiştên li jêr de, helwesta xwe diyar bikim (dipejirînim/napejirînim) û sedema wê hilbijartinê, diyar bikim:**

- Firoşkar, bi armanca firotina kelûpelên xwe, kêmaniyên wan veşartine.

  (          )..................................................

- Bêrîtanê, di ezmûnê de bersivên pirsan ji hevala xwe veguhestin

  (          )..................................................

- Bazirgan, qutiyên ku dema wan a bikaranînê bi dawî bûye, ji nav dibe (diavêje).

  (          )..................................................

## Bixwînim û sergihayî bikim

Ji ber ku di xapandinê de, sitemkarî û fêlbazî heye, islamê û hemû olan, xapandin bi hemû cureyên wê, qedexe kiriye.

**Ji ziyanên xapandinê li civakê:**

**1. Belvbûna gendelî û gengeşeyê.**

**2. ............................................**

**3. ............................................**

**Ji waneyê fêr bibim**

**1. Xapandin gunehkarî ye.**

**2. Ez ê xwe ji hemû awayên xapandinê, dûr bixim.**

**3. ........................................................................**

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

Dema ku di civakê de, xapandin bi yekcarî nemîne, wê çi encam rû bidin? Vê yekê diyar bikim û li lênûsa xwe, binivîsim.

# 5 NIMÊJ (ŞKESTIN Û MEKROHIYÊN WÊ)

Peristin

## Bixwînim û fêr bibim

Nimêj di islamê de, peristineke girîng e. Mirov di nimêjê de bi aştî û nêzîkbûna ji Xweda dihese. Divê kesê misilman bi rengê herî guncaw li gorî hîm û mercên wê, vê peristinê pêk bîne û parastina vê yekê bike û ji tiştên ku nimêjê dişkînin û xera dikin, dûr bikeve.

**Tiştên ku nimêjê dişkînin û dubarekirina wê ferz dikin, ev in:**

**1. Nepêkanîna hîmekî yan mercekî nimêjê.**

**2. Xwarin û vexwarin.**

**3. Tevgerên zêde.**

**4. Kenê bilind.**

## Bixwînim û sergihayî bikim

Nimêj peristineke giyanî ye, ew aramî û rêzkariyê dixwaze û divê di nimêjê de, nimêjker xwe ji tevlihevî û mekrohiyan, dûr bixe.

**Ji mekrohiyên nimêjê:**

**1. Hin sinetên nimêjê bên hiştin.**

**2. Nêrîna li asîman.**

**3. Bi dest, cil û tiştên din bê mijûlkirin.**

**4. Girtina çavan.**

**5. ………………..**

**6. ………………..**

## Çalakî

**Bixwînim û li gorî latikê, dabeşkirinê pêk bînim:**

kenê bilind - xwarin - çavgirtin - axaftin - nimêja ku di dema amadebûna xwarinê de- nimêja di rêya çûn û hatinê de.

| Şkestinên nimêjê | Mekrohiyên nimêjê |
|---|---|
| Kenê bilind | Çavgirtin |
| .............. | .............. |
| .............. | .............. |

## Ji waneyê fêr bibim

**1. Dûrketina ji mekrohiyan, aramiyê di nimêjê de pêk tîne.**

**2. .............................................................................................**

**Ez ê têgihiştina xwe ji waneyê re taqî bikim:**

Ez ê li lênûsa xwe, çawaniya kirina nimêjê li gorî gavên wê yên sereke binivîsim.